Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûrya 1957

Çileyê Pêşîn / 1 - 12 - 2021 Kurdistan-Hejmar (210) www.pdk-s.com

# "Xelkê Efrînê ji kiryarên grûpên çekdar rizgar bikin"

Kurdistan Mihemed Şêxî



Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS di daxuyaniyekê de ragehand: Ew kiryar û tawanên ku li Efrînê ji aliyê girûpên çekdar ve têne kirin şermezar dikin. û bi taybet ewên ji aliyê grûpa ser bi Ebû Emşa ve ku navdare bi kiryarên xwe di kuştin revandin û sivkatî bi welatiyên Kurd. û sepandian bacan bi ser wan ve.ENKS di daxuyaniya xwe de daxwaza serbestberdana hemû girtiyan dike. Herwiha Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê daxwaz ji rêxistinên mafên mirovan. civaka navdewletî û Tirkiyê kir ku sînorekî ji van kiryaran re deyne ku berdewam derheqê welatiyan ji aliyê grûpên çekdar ve têne kirin. û ev yek jî dibe sedema koçberî û guhertina demografî. Welatiyekî Efrînê ji rojnameya Kurdistan re dibêje. heger hat û ENKS ev kiryar rawestand wê demê dê hejmareke baş ya xelkê Efrînê vegerin ser mal û milkên xwe. lewma divê karekî cidî di vê derbarê de bike û bi taybet fişarekê li Tirkiyê bike ji ber ku ew tenê dikare van kiryaran rawestîne.
Welatiyekî din dibêje. xelkê Efrînê hêjayî jiyaneke xweş in û nabe di vê rewşê de bimînin û divê Neteweyên Yekgirtî karekî bike û bi hemû karînên xwe sînorekî ji van grûpan re deyne.

# ENKS: Helmetên dijî Pêşmergeyên Roj xizmeta dijminan dike

Kurdistan



Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS daxuyaniyek derbarê helmeta li dijî Pêşmergeyên Roj ji aliyê ragihandina PYD ve belav kir. Di daxuyaniya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS de hatiye: Pêşmergeyên Roj hêzeke leşkerî ye ku ji hejmareke keç û ciwanên Kurdên Kurdistana Sûriyê pêk tê ku koçberî redkirin û jiyana xwe ji bo berevanîkirin di ber gel û xak û welatên xwe hilbijartine. û tevlî hejmarek şerên dijî çekdarên DAIŞê bûn li Herêma Kurdistanê û dastan tomar kirine û ev yek gelek şahidên wê hene û xwîn jî di ber xaka Kurdistanê û gelê wê de dane. Encûmena Niştîmaniya Kurdî sîwana siyasî ya Pêşmergeyên Roj e. û karekî cidî ligel Hevpeymaniya Navdewletî kir ji bo dabînkirina zemînekê ji bo vegera wan û berevanîkirin di ber dever û miltên xwe de. û hertim ev daxwaz ji aliyê Partiya yekîtiya demokratîk PYD ve dihate redkirin. heta îmzekirina rêkeftina Duhokê di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî ENKS û Partiya yekîtiya Demokratîk ku şeraketa leşkerî jî li xwe girt û PYD pabendî bendên vê rêkeftinê nebû. û ji dema destpêkirina danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî û Partiya yekîtiya Demokratîk bi serperiştiya Emerîka û gerantiya HSD. û ragihandina bi ser PYD û PKK ve. herwiha hejmareke serkirdeyên van aliyan berdewam êrîşî hêzên Pêşmerge dikin û derewan li ser wan dirust dikin. û hêzên ewlekarî ser bi PYD ve berdewam bangî malbatên Pêşmergeyên Roj li tevahiya deverên Kurdistana Sûriyê dikirin û gefên kuştin û dersînorkirinê li wan dikirin û daxwaz ji wan dikirin ku fişarê li zarokên xwe bikin heta ku dev ji hêzên Pêşmerge berdin. heta ku gihişte vê yekê hejmareke malbatên Pêşmergeyên Roj neçar kirine ku daxuyaniyên vîdyoyî li dijê zarokên xwe bidi new jî di jêr gefê û di jêr serperiştiya kadirên leşkerî bi armanca belavkirina van hevdîtinan li ser ragihandina xwe bi şêweyekî erzan ku şêweyê sîstemên dektatorî derheqê gelê me bibîr tîne.Li ser ti kes û aliyekî nayê veşartin zêdekirina van helmetên dijî Pêşmergeyên Roj di demekê de ne ku aliyê Emerîkî hewlên xwe berdewam dike ji bo berdewamiya danûstandinên ligel Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS. taybet di dosya leşkerî û ewlekarî de ku du dosyên giring in dê li ser maseya danûstandinan werin gotûbêjkirin. Encûmena Niştîmaniya Kurdî di daxuyaniya xwe de wiha berdewam dike. Encûmena Niştîmaniya Kurdî di dema ku sivkatiya bi qurbaniyên Pêşmergeyên Roj şermezar dike. vê yekê jî wek sivkatî bi tevahiya gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê dibîne. Herwiha ev helmet di vê qonaxê de armanc jê têkdana daxwazên berdewamiya danûstandinên Kurdî ye. û reve ji pabendiyên berya niha ku di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî û Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD bi serperiştiya Emerîka rêkeftin li ser hatibû kirin. û daxwaza rawestandina van kiryaran dikin ku tenê di berjewendiya dijminên gelê Kurd û doza wî ya rewa de ye.

## Serbestberdana çekdarên DAIŞê tawan e

Kurdistan-Bidûvçûn

Rojnameya “The Gaurdian” a Brîtanî belav kir. Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) bi pereyan. çekdarên DAIŞê yên girtî. serbest berdide. Rojnameya “The Gaurdian” li ser zarê du kesan belav kiriye ku ew berê çekdarên DAIŞê bûn û li cem HSDê girtî bûn û li hember heşt hezar Dolarên Amerîkî hatine berdan. Ew her du kes dibêjin. ew di çarçoveya lihevhatinan de hatine berdan. bi mercê ku nabe ew tevlî ti rêxistineke din bibin û divê ji herêmên HSDê derkevin. Ev kesên zanyarî dane rojnameya Guardian. Sûrî ne û li Tirkiyê dimînin. berê ew çekdarên DAIŞê bûn û şer jî kirine. Malbatên wan jî di çarçoveya lihevhatinan de ji kampa Holê hatine derxistin. Ew her du dibêjin. ew hejmara kesên bi vê riyê ji cem HSDê hatine berdan. nizanin çend e. lê ew bi xwe 10 kesan nas dikin ku bi vî awayî hatine berdan. Yek ji wan kesan. bi navê Ebû Cafer e. ji malbateke dewlemend a Reqayê ye. di nava DAIŞê de efserê ewlehiyê bû. sala 2019an li Baxozê ji aliyê HSDê ve hatibû girtin û 2 salan di zîndanê de mabû. Ebû Cafer dibêje. wî 8 hezar Dolar wek bac û 22 hezar Dolar wek bertîl dane berpirsên HSDê. heta ku hatiye berdan. Kesekî din ê bi navê Ebû Mihemed ku xelkê Dêrezorê ye. serperiştyarê yekîneyeke DAIŞê bûye di şerê dijî HSDê de. di sala 2014an de beşdarî şerê Kobaniyê bûye. ew jî di şerê Baxozê de ketiye destê şervanên HSDê. Ji bo azadkirina Ebû Mihemed jî 8 hezar Dolar jê hatiye wergirtin û 14 hezarên din jî weke bertîl dane. Li gor amaran. 10 hezar çekdarên DAIŞê li zindanên HSDê ne. ji wan 8 hezar kes Sûrî û Iraqî. 2 hezar çekdarên din jî biyanî ne. Berdevkê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) ev îdia red kiriye û dibêje: “Tiştekî wisa tune ye.”Welatiyekî Kurd li ser vê mijarê dibêje. heta niha bi dehan Kurdên me li cem wan bê sedem girtî û wan bernadin. lê çekdarên DAIŞê têne berdan. gelo ev yek ji berpirsyaretiya kê ye. û divê çi di vê derbarê de were kirin. Welatiyekî din jî dibêje. ev yek bê exlaqiye beramber qurbaniyên destê DAIŞê ye. û divê ev alî werin sizadan. ji berk u ew tawaneke mezin li dijî mirovahiyê dikin.

# Revandina zarokan ji aliyê PYD ve berdewam e



Kurdistan-Alan Cuma

Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD. û çekdarên ser bi wê ve di revandina zarokên temenên wan di jêr 18 salan de berdewam in. û di dema dawî de hejmareke zêde ya zarokan revandine. Di dema dawî de çekdarên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve li Kurdistana Sûriyê û deverên di jêr desthilata wê de bi dehan zarokên temenê wan di jêr 18 salan de revandine ew jî bi armanca leşkeriya neçar. û çarenivîsa hejmareke ji wan zarokan nediyar e û malbatên wan jî nizanin ku li ku ne. Ew zarokên hatine revandin hemû jî temenê wan di jêr 16 salan de ye. û ew tevlî hin xulên taybet hatine kirin da ku tevlî şeran bibin. Navên kesên hatine revandin ev in:
-Îsam Mihemed Îsa temenê wî 13 salî ye û xelkê gundê Qitmê yê Nahiya Şera ya Efrînê ye û ji taxa Şêx Meqsûd ya Helebê hatiye revandin.
- Xetab Ibêd Hesen temenê wî 15 salî ye û xelkê taxa Hilêliyê ya Qamişlo ye û di 24 Çirya Paşîn hatibû revandin.
-Evîn Celal Xelîl temenê wê 15 sal e û roja Yekşemê Çirya Paşîn ji bajarê Amûdê hatiye revandin û rewşa tenduristiya wê jî xerab e.
-Ayana Idrîs Ibrahîm temenê wê 16 sale û xelka bajarê Amûdê ye.
-Hediye Ebdulrehîm Enter temenê wê 15 salî ye û xelka bajarê Amûdê ye. Evîn û Ayana û Hediye bi hev re ji Amûdê hatine revandin.
- Ebîr Kastro Ebdulwezîz xelka gundê Pilîsiyê ya Dêrikê ye û ji bajarê Qamişlo di 2ê meha Çirya Paşîn hatiye revandin û ev keç ji dayikbûya sala 2006ane û hin nexweşiyên wê jî hene.
-Sîdra Xelîl Ibrahîm ji gundê Ebûdanê ya Nahiya Bilibilê ya Efrînê. di 6 Çirya Paşîn ji taxa Şêx Meqsûd ya Helebê hatibû revandin.
-Mihemed Ebdo Bozo ji gundê Keferdelê ya Nahiya Cindirêsê ya Efrînê ye û ji kampên Şehba li Helebê hatine revandin.
-Ebdulrehman Ehmed Biro ji taxa Eşrefiyê ya Helebê hatibû revandin û nexweşiyên giran pêre hene.
-Piştî revandina wê di sala derbasbûyî de. hewla revandina Sîlva Nidal Îsa ya ji gundê Cilbirê ya Nahiya Şêrewa ya Efrînê hate dan. lê mamê wê Ebdo Îsa destêwerdan kir û gef li wan xwar heger keça wan bernedin dê kiryarên wan eşkere bike. piştre ew bi xwe revandin li taxa Şêx Meqsûd û heta niha çarenivîêsa wî nediyar e. Di sala 11-2019-12 Sîlva hatibû revandin û di 12020-1- wê karîbû xwe ji nava destê wan birevîne. Herwiha ji aliyê xwe ve Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS di 24ê Çirya Paşîn de daxuyaniyek I bo raya giştî belav kiribû derbarê berdewamiya leşkerkirina zarokan ji aliyê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD û çekdar û grûpên ser bi wê ve. herwiha ENKS di rêya vê daxuyaniyê daxwaz ji Neteweyên yekgirtî û rêxistinên navdewletî û aliyên peywendîdar bi parastina zarokan û Hevpeymaniya Navdewletî kirk u bi erkê xwe di vê derbarê de rabin ji vegerandina van zarokan ji bo malbatên wan û sînorek ji kiryarên Ciwanên Şoeşger re.
Li ser vê mijarê parêzerek dibêje. ev hemû kiryar têne kirin û qaşo rêkeftinek di navbera HSD û Neteweyên Yekgitî de heye ku bo nehiştina vê diyardeyê. raste ev rêkeftin heye. lê yên van karan dikin baskên ser bi PKK ve li Kurdistana Sûriyê. ew dixwazin hejmara endamên xwe zêde bikin û zarokan bi xwe ve girê bidin da ku ligel wan bimînin.Divê xelk li dijî kiryarên PKK û PYD derkevin ji berk u heger ti kes serî hilnede dê di kiryarên xwe de berdewam bin.
Welatiyek dibêje. ev kiryar dihêle ku xelkê zarokên xwe ji deverê birevînin. û koçber bibin. pêwîste rêxistinên navdewletî sînorekî ji van kiryaran re deynin.



# Jinên Kurd rastî tundiyê tên






Emel Hesen –Elmaniya

Kampanyaya cîhanî her sal di 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya Li Ser Jinê ya Navdewletî dest pê dike û di 10ê Kanûnê - Roja Cîhanî ya Mafên Mirovan de bi dawî dibe û ev yek binpêkirina mafên mirovan e. Weke ku em dibînin her sal ji meha Mijdarê û vir ve hemleya li dijî tundiya li ser jinê dest pê dike û armanca wê ew e ku destkeftiyên wê yên herî girîng destnîşan bike. destkeftiyên jinan ên di jiyanê de bi dest xistine biparêze. hişmendiya civakê belav bike û di hemû qadan de piştgiriya manewî bike. Piştgiriya derûnî ji wê re peyda dike. pirsgirêkên xwe yên ku bi rêwîtiya wê re û hîn jî bi xwe re çareser dike û di mijarên malbatê de gavên erênî dinirxîne. Rêzgirtina ji bo jina ku karîbû li pêşberî civakê bisekine û li gel wê jî rêya jiyanê temam bike. Dest bi şikandina bêdengiya ku ji aliyê rêgez û kevneşopiyên civakê ve hatibû ferzkirin. ji mafên wê yên herî bingehîn bêpar kir. Gelek cureyên tundiyê li dijî wê hatin kirin. her yek wek lêdan. heqaret. heqaret. perîşanî. zehmetî. bêparkirina wê ji xwendin û mîratê. bi pêkanîna tawanên li dijî wê yên wek sunetkirin û zewaca keçên temenbiçûk û astengkirina wê. ji hilbijartina hevjînê xwe. Û ji mafên wê yên herî bingehîn bêpar kirin û di çarenûsa wê de lîstin. Di wan demên ku her kesî jiyan û çarenûsa jina Kurd kontrol dikir. wê bêdengiya xwe şikand û li ser lingan sekinî. bi hemû zehmetî û karesatan re rû bi rû ma û di civakê de rola xwe ya mêranî lîst. Bû Doktor. Endezyar. Parêzer. Mamosta. Nivîskar. Rojnamevan. Helbestvan. Hunermend. Siyasetmedar û pêşmerge .Şervan. û îro jî di hemû waran de roleke girîng dilîze. Tevî sîngê xwe yê germ. û dilê xwe yê nazik. bi kahniya xwe ya diyasayî ya xwedayî. wê karîbû bi rastê xwe dergûşê bihejîne û bi çepê xwe dinya bihejîne. Mixabin tevî van hemû geşedanan û ruhê berxwedanê yê jina Kurd. û serkeftin û destkeftiyên jinên Kurd. hîna jî ew qurbaniya rejîmên dîktator e. û rasterast qurbaniya şerên li pey hev. weke lawaztirîn hebûna di pevçûnan de. û rûyê dûrxistin û marjînalbûnê. Dijminên doza gelê Kurd ji (Leyla Qassem) ne razî bûn. û ji kîn û nefreta xwe ya jina Kurd razî nebûn. lê ew ji bo xwe dijminê mezin dîtin. tevî berdewamiya tundiya li ser keç. hunermend û çalakvanên Kurd. . û jinên Kurd li herçar parçeyên Kurdistanê û bi gelek şêweyan. Mîna Efrîna birîndar. ku milîs û leşkerên Tirk binpêkirinên herî mezin li dijî jinan pêk tînin. ji dagirkeriyê dikişîne. Ji ber vê yekê di 25ê Mijdarê de jinên Kurd şermezarkirin û şermezarkirina tawanên hovane yên li dijî mirovahiyê radigihînin û bang li dezgehên navdewletî û rêxistinên mafên mirovan dikin ku destwerdanê bikin û bizanin ka çi bi serê jinên Kurd li Efrînê tê. heta kengê wê jinên Kurd bibin qurbanî. ji van êrîşan? Çima ev bêdengiya navneteweyî ya ku li ser qada bajarên me daleqandî ye? Rêxistinên navneteweyî yên ku ji êrîşên Tirkiyê daxwaza mafên jinan û parastina jinan dikin li ku ne?!Di dawiyê de: Rê û rêbazên tundî û îşkenceyê çi qas cûda bin jî. jinên Kurd tevî îşkence. kuştin û kiryarên neexlaqî yên dijminên netewa Kurd. dest ji têkoşîna xwe bernadin. berovajî wê. jinên Kurd wê ji bo mafên xwe têbikoşin. û azadiya welatê xwe tim û her dem .

## Çîrokek watedar



Luqman Mihemed Belî

Padîşahekî li welêt ragihand. kî gotineke watedar bêje dê bi 400 dînaran were xelata kirin!!
Rojekê. dema ku padîşah û leşkerên xwe dinav kolan û zikakên bajêr dimeşiyan. çavên padîşah bi Cotkarekî pîr dikeve ku Temenê wî zêdetir ji90 salî ye. û dibîne ew pîre mêr wê dareka zeytûna diçîne.
padîşah jê dipirse: Çima dara zeytûnê diçînî tu dizanî bîst sal jê re divê ta berbigre û tu bixwe pîrekî lingek te ji derve ye û yê din jî di gorê ( Qebir) de ye?
Cotkarê pîr jî jê re dibêje Pêşiyên me diçandin. me berhemên wan rakirin û em diçînin. da ku nifişên piştî me mifayekî jê werbigrin.
Padîşah got.. ev gotinek watedar e.. lewra ferman da ku 400 dînaran bidin wî. cotkarê pîr 400 dînaran werdigire û dikene!!
Padîşah dibêje:
Çima tu dikenî??
Cotkar dibêje:
Dara zeytûnê piştî bîst salan fêkî dide. dara min jî niha ve fêkî dide!!!!
Padîşah dibêje ev jî gotinek xweş e carek din ferman dide 400 dînarên din jî didin wî û cotkar jî werdigre û dîsan dikene!!
Padîşah dibêje:
Çima tu dikenî??
Cotkar dibêje:
Dara zeytûnê salê carekê û ya min du caran fêkî dide!!
Û padîşah got:
Baş e.. 400 dînarên din jî bidin wî.. paşê padîşah bi lez ji wê derê diçe
Û serokê leşkeran jê re dibêje:
Ezbenî. tu çima ewqas zû çûyî?
Padîşah got:
Ger hûn heta sibehê rûnin. dê xezîneya dewletê Vala bibe
Û gotinên vî kalê 90 salî bi dawî nabin .
Ji ber ku (Gotina xweş timî berhemdar e)